
ODEYA ENDEZYARÊN AVAHIYÊ

# 7. SEMPOZYÛMA NAVNETEWEYÎ LI DERBARÊ QEWÎKIRIN Û PARASTINA AVAHIYÊN DÎROKÎ

27-28Ê ÎLONÊ 2024

AMED



tarihiyapilar.org / tarihiyapilar@imo.org.tr

**Dîroka dawî ya şandina nivîsan: 15ê Gulanê 2024**

**ORGANÎZE KIRIN JI ALIYÊ:**

**ODEYA ENDEZYARÊN AVAHIYÊ ŞAXA ENQEREYÊ**

**ODEYA ENDEZYARÊN AVAHIYÊ ŞAXA AMEDÊ**

# 7. SEMPOZYÛMA NAVNETEWEYÎ LI DERBARÊ QEWÎKIRIN Û PARASTINA AVAHIYÊN DÎROKÎ



Erdnîgariya qedîm, Mezopotamyaya jorîn ku welatê me û Anatolyayê digre nava xwe, xwedî gelek berhemên girîngin. Vê axê, ji dîrokê re şahidê kiriye û bi avahiyên xwe yên kevnar xwedî cihekî girîng e. Her wiha di cîhanê de yek ji cihên erdhejê ye. Ev her du rastî, girîngiya ewlehî û bihêzkirina avahiyên dîrokî bi awayek pir zelal nîşan dide. Bi vê yekê re, parastina mîrateyên dîrokê, parastina pira di navbera paşeroj û pêşerojê de û berdewamiya tekiliyên nifşan ji bo pêşketina civakê gelek girîng e. Wekî Odeya Endezyarên Avahiyê, bi armanca bicihanîna berpirsyariyên ku dikevin ser me, em difikirin ku bi lidarxistina sempozyûman, di warê parastina avahiyên dîrokî de em ê piştgiriyê bidin. Sempozyûma yekem di sala 2007'an de li Enqereyê, ya duyem di sala 2009'an de bi beşdariya kesên ji welatên din li Amedê hatibû lidarxistin û bi saya wan sempozyûman, nêzîkahiya li restorasyona (nuvekirin) avahiyên dîrokî, proje û pêkanîna xizmetan baştir bûbû. Bi vê yekê helwestên statîk û dînamîk jî hatin lêpirsînkirin û ji bo pêvajoyek baştir a restorasyonê, divê ku endezyarên avahiyê zêdetir bibin xwedî gotin. Dûre sempozyûm li Erzirom, Trabzonê hatin lidarxistin û niha jî dê cara 7'an li Amedê ya navneteweyî yê were lidarxistin.

Welatê me di warê restorasyon û bihêzkirina avahiyên dîrokî de hê li destpêka rê ye û gelek tiştên ku divê werin kirin hene. Avahiyên dîrokî li gorî resenî û modela xwe baş nayên çêkirin. Di warê analîzê de çawa ku gelek nezelalî hene, di warê pêkanînê de jî gelek kêmasî û pirsgirêkên ku divê werin çareserkirin hene. Bi taybetî di salên dawî de bi zêdebûna restorekirina avahiyên dîrokî re, ev pirs zêdetir bûne û ji bo bersiva wan were dayîn komisyonek ku ji aliyê Gerînendehiya Giştî ya Weqfan ve hatiye avakirin; rênîşa 'Ji bo avahiyên dîrokî birêvebirina xeterên erdhejê' amade kiriye. Rênîşek (kilavûz) wiha ji bo endezyarên ku di warê Dahûrana avahiyên dîrokî de dixebitin bûye çavkaniyek girîng.

Bi taybetî di vê pêvajoyê de endezyarên avahiya jî di warê avahiyên dîrokî de bi pêş ketine, zêdetir peywir girtine. Ev yek jî ji bo ewlehiya avahiyên me gelek girîng e. Bi vê konferansê dê di asta navneteweyî de pisporên vê yekê werin ba hev û eleqeya endezyarên avahiyê yên li welat li ser vê mijarê zêde bike û di warê nirxandin û bihêzkirina avahiyên dîrokî de, hejmara endezyarên avahiyê yên pispor zêdetir bibin.

Yek ji armancên vê sempozyûmê jî ew e ku li ser mijara nirxandin û bihêzkirina avahiyên dîrokî, bi kesên pispor ên werin welatê me re nîqaş werin kirin. Bi beşdarbûna saziyên endezyar û avahîsazên di qada giştî de û fîrmayên pêkanîner, armanc ew e ku teknîkên pêşketî yên di roja me de hem di warê analîzê de hem jî di pêkanînê de bikevin welatê me. Wekî encam; ev sempozyûm dê ji bo endezyarên me yên ku Dahûranan dikin, re bibe bersiv û rêbazên rasteqîntir werin bikaranîn, ji bo restorasyona avahiyên dîrokî projeyên rast û baştir werin pêşxistin û ji bo pêkanîna wan, teknîk û kereseyên pêşketîtir werin bikaranîn.

Di vê sempozyûmê de dê mijarên girîng ên wekî; Diyarkirin û Şopandina Rêbazên ku Zirarê Nadin Avahiyên Dîrokî, Diyarkirina Performansa Avahiyên Dîrokî li himberî Erdhejê û Bihêzkirina wan, Dahûrana Binyadî, Xebatên bihêzkirinê û Mînakên Pêkanînê, di Avahiyên Dîrokî de Xisarên ku ji Erdê Çêbûne û Pêşniyarên ji bo Restorasyona Guncaw, werin nîqaşkirin. Di encamê de dê ev sempozyûm, bibe wesîle ku li ser her mijara têkildarî avahiyên dîrokî nîqaş di platformên navneteweyî de were kirin.

Lidarxistina cara heftemîn a vê sempozyûmê li vî bajarê ku ji aliyê avahiyên dîrokî ve dewlemend e girîng e. Ji ber wê teybetmendiyê jî vî bajarê re dibejin; "Bajarê ku dîrok li ser keviran hatiye nivîsandin" ango li Amedê lidarxistina wê zêdetir girîng e. Em ji hemû akademîsyenên ku bi avahiyên dîrokî re têkildar in, avahîsaz û endezyarên di sektora giştî û taybet de, fîrmayên pêkanîner, hêvî dikin ku beşdarî semopzyûmê bibin û piştgirî bidin. Armanc ew e ku di dawiyê de em hemû belavokan bînin ba hev û di vê mijarê de pirtûkeke çavkaniyê li lîteratorê zêde bikin.

Li ser navê lijneya amadekar
**Îdrîs Bedirhanoglu (Serok)**



## SEMPOZYÛMÊN BIÇÛK

### Di bin Barên ne Asayî de Nêzîkahiya li Avahiyê

**Prof. Dr. Polat GÜLKAN - Zanîngeha Başkentê**
**Prof. Dr. İdris BEDİRHANOĞLU - Zanîngeha Dîcleyê û Profesorê Mêvan Li Zanîngeha Oxfordê**
**Guherîna avhewayê xwedî potansiyela ku dikare barê li ser derdora hatiye avakirin bigihîjîne xalên herî jor. Bandorên meteorolojîk (Guherînên di warê baran, berf, ba, suhunet û hwd.) dema ku zêde dibin, li ser avahiyan bandorên giran dikin. Wekî lêdana wesayîdê, agir, lêdana birûskê, teqîn, qelişandin. Li bajaran rûxîna avahiyên nêzî hev, bi kontrol be jî teqîna ku ji ber bandora wê hejandin çêdibin û hwd. yanî tiştên ku nayên texmînkirin û hêvîkirin û diqewimin, bandora wan ji texmînê pir zêdetir e.**
**Performansa avahiyên dîrokî li dijî erdhejan**
**Barana zêde, rabûna lehiyê û di bin germahiya zêde de avahiyên dîrokî**
**Bandorên hewaya qirêj a endustriyel li ser avahiyên dîrokî**
**Ji ber guherînên derdorê, guherîna zemînê û bandorên wê yên li ser avahiyên dîrokî**

### Performansa Avahiyên Dîrokî ya Erdheje

**Doç. Dr. Sinan AÇIKGÖZ - Zanîngeha Oxfordê**
**A. Doç. Dr. Bora PULATSU - Zanîngeha Carletonê**
**Rojhelatê Tirkîye yê ji dêmên kevîn ve buye navenda gel û bawerî yên cida cida. Şeşe Sibatê zemînhêjek mezin (Mw 7.8 û 7.6) pêk hat û pîştî wan jî gelek zemînhêjên biçuk jî çêbun. Li wan erdhêjan de 50000 zêdetir kes jîyana xwe ji dest dan û zêdeyî 280000 avahî jî xetereyên mezîn dîtin.**
**Liv ê sempozyoma biçuk de bandora erdhêjê li ser avahîn dîrokê yên bajarên erdhê yê bê lêkolînkirin û taybetî ev mijarên henê yê bên nîkaşkirin:**
**Tipolojîya avahîyên cure cure (mizgeft, dêr, awahîyên alanî û niştecihbûnê hwd), çawderîyên li ser bandora teknîkên avahîsazîyê li ser performansê, li bondora sismolîyê, kuç, ber û xercên dîrokî û analîzê avahîya. Wekîdin jî li ser nuveçêkirin û zeximkirina wan avahîyan jî yê mijar bê nîkaşkirin**

### Di Avahiyên Dîrokî de Zemîn û Hîm

**Prof. Dr. M. Salih Keskin - Zanîngeha Dîcleyê**
**Li Tirkîye yê hımarek pir zêde avahîyên dîrokî hene û dema ku em berê xwe didin wan pirên wan xetereyên strukturel hene.Erdhêj, mercên zemînê, guherînen mercên ava binerd, zêdehîyên li avahîyan tên kirin herwekindên gelek faktorên bi vî cureyî xeterên mezin didin wan avahîyan. Derhekê avahîyên dîrokî de gelek lêkolîn çêbûne li belê hindik ji wan derhêkê milkên zemînê û kewîkirina wan dene. Himên avahîyan jî beşek ji nasnameya vê ya dîrokîye. Himên avahîyên dîrokî jî divên bên parastin. Lêkolênên bê çêkirin de pêwîste kû curêyên himan, firehî û kûbûna wan bên dîyarkîrin. Bi lêkolinê barhilgirtên û runiştinên wan bên dîyarkirin û li gorî wê jî zemîn bên zeximkirin û orijinalitâ wê jî bê parastin. Di wê sempozyuma biçuk de ev mijarên he yê bên nîkaşkirin:**

**Etuda zemîn û nirxandina geoteknîk**
**Di Avahiyên Dîrokî de Têkiliya Zemîn-Avahî**
**Di Avahiyên Dîrokî de Xisarên ku ji ber Zemînê Çêdibin û Pêşniyarên Guncaw ên Mudaxeleyê**
**Hîmê avahiyên dîrokî, nirxandin û teknîkên bihêzkirinê**
**Hîmê avahiyên dîrokî, rêbazên başkirin û bihêzkirinê**



## MIJARÊN SEMPOZYÛMÊ

### 1. Di Avahiyên Dîrokî de Şopandina Qewîbûna Avahî û Arşîvkirin

**1.a. Rêbaza Diyarkirina bê Xisar a Qewîbûna Avahiyên Dîrokî û Şopandina wan**
**1.b. Ji bo Avahiyên Dîrokî Deftera Jimêryariyê û Sazkirina Bankeya Daneyan (Cihî, Neteweyî û Welatên Cîran?)**
**1.c. Arşîvkirin**

### 2. Ji Aliyê Erdhejê ve Avahiyên Dîrokî, Dahûrana Avahî û Bihêzkirin

**2.a. Di Dahûrana Avahiyên Dîrokî de Rêbazên Nû**
**2.b. Xisarên ji ber Erdhejê û ji bo Parastina Avahiyên Dîrokî Pêşniyarên Şênber**
**2.c. Diyarkirina Performansa Avahiyên Dîrokî li Pêşberî Erdhejê**
**2.d. Xebatên Nûvekirin û Mînakên Pêkanînê**

### 3. Kereseyên ku di Avahiyên Dîrokî de Hatine Bikaranîn

**3.a. Mînakên Kereseyên ku di Avahiyên Dîrokî de Hatine Bikaranîn**
**3.b. Di Restorekirina Avahiyên Dîrokî de Bikaranîna Xerca Amade**
**3.c. Di Parastina Avahiyên Dîrokî de Nirxandinên li ser Bikaranîna Kereseyan**
**3.d. Dahûrana li ser Kereseyan û Nirxandina Laboratuarên Kereseyan**
**3.e. Di Restorasyon û Parastinê de Lêgerînên Kereseyên Nûjen, Bikaranîna Kereseyên Rast**
**3.f. Di Restorasyonê de Rêbazên Nû**

### 4. Di Avahiyên Dîrokî de Pîvanên Mijare û Parastinê

**4.a. Di Parastina Çanda me ya Mîrateyî de Girîngiya Xebata bi Disîplîn**
**4.b. Di Mekanîzmayên Biryarê yên ji bo Restorasyonê de Cih û Girîngiya Endezyariya Avahiyê**
**4.c. Têkildarî Avahiyên Dîrokî Xebat û Nirxandinên Sazî û Dezgehên Giştî; Lêhûrbûn û Çavdêriya Rêbazên ku tên Bikaranîn**
**4.d. Di Parastina Avahiyên Dîrokî de Aliyê Çandî û Aborî û Pirsgirêkên heyî**
**4.e. Di Parastina Avahiyên Dîrokî de Pirsgirêkên ku Derdikevin**
**4.f. Di Dewrkirina Avahiyên Dîrokî ji bo Pêşerojê de Têkiliya Zanîngehek Baş-Sektora Giştî û Taybet**
**4.g. Di Avahiyên Dîrokî de Bandorên Derdorê**
**4.h. Têkiliya, Avahiyên di Parastina Mîrateya Çandî, Dîrokî, Têgeha xwedîtiyê û bingeha Hiqûqî de**
**4.i. Di Parastin û Nûvekirin de Zêdekirina Pêkanînên ji bo Teşwîqê**

### 5. Di Avahiyên Dîrokî de Pêkanînên Restorasyonê

**5.a. Di Avahiyên Dîrokî de Nûvekirin**
**5.b. Pirên Dîrokî û Avahiyên Avê yên Dîrokî**
**5.c. Restorasyon Proje û Xebatên Pêkanînê**
**5.d. Pêkanînên Rekonstruksiyonê**
**5.e. Di Çarçoveya Rêgezên Parastin û Mijarê de Mînakên Pêkanîna Erênî û Neyînî**
**5.f. Di Pêkanînê de Stratejiyên Parastinê û Mijarên Têkildarî Restorasyonê**

**7. SEMPOZYÛMA NAVNETEWEYÎ LI DERBARÊ QEWÎKIRIN Û PARASTINA AVAHIYÊN DÎROKÎ**



## ROJÊN GIRÎNG

**Nivîsan ên ku ji bo sempozyûmê bên pêşkêşkirin divê herî dereng heta 1ê Gulana 2024an ji navnîşana tarihiyapilar@imo.org.tr re bên şandin.**

### LIJNEYA AMADEKAR

**PROF.DR. ÎDRİS BEDIRHANOGLU (SEROK)**
**MAHSUM ÇIYA KORKMAZ (SEROKÊ ŞAXA ODEYA ENDEZYARÊN AVAHIYÊ YA AMEDÊ)**
**BULENT TATLI (SEROKÊ ŞAXA ODEYA ENDEZYARÊN AVAHIYÊ YA ENQERÊ)**
**TANSEL ONAL (RÊVEBERÊ NAVENDA GIŞTÎ)**
**PROF.DR. ERHAN KARAESME (ZANÎNGEHA ODTUYÊ)**
**PROF.DR. MUSTAFA TOKYAY (ZANÎNGEHA ODTUYÊ)**
**PROF.DR. SALIH KESKÎN (ZANÎNGEHA DÎCLEYÊ)**
**PROF. DR. NESLÎHAN DALKILIÇ (ZANÎNGEHA DÎCLEYÊ.)**
**PROF.DR. A.HALÎM KARAŞÎN (ZANÎNGEHA DÎCLEYÊ)**
**MEHMET EJDER AKCAN (İMO)**

### SEKRETERYA

**MEHMET ZEKÎ ŞÎMŞEK (SEKRETERÊ ŞAXA AMEDÊ)**
**MAHÎR KAYGUSUZ (SEKRETERÊ ŞAXA ENQEREYÊ)**
**Dr. REHBER AKDOGAN (ÎMO)**
**BUKET ÇELÎK (ENQERE ÎMO)**

### Navnîşan:

**TMMOB ODEYA ENDEZYARÊN AVAHIYÊ ŞAXA AMEDÊ**
**Kolana Alî Emîrî ya 5. Apartmana Yilmaz 2000 Hejmar: 5**
**Bajarê nû / Amed**
**Tel: +90 412 2239643 - Faks: +90 412 2239643**
**e-posta: imodiyarbakir@imo.org.tr**

**TMMOB ODEYA ENDEZYARÊN AVAHIYÊ ŞAXA ENQEREYÊ**
**Kolana Necatîbey Hejmar: 57 Kat: 4 06440 Çankaya /Enqere**
**Tel: +90 312 2943066 - Faks: +90 312 2943077**
**e-posta: imoankara@imo.org.tr**

ODEYA ENDEZYARÊN AVAHIYÊ
27-28Ê ÎLONÊ 2024
AMED
7. SEMPOZYÛMA NAVNETEWEYÎ LI
DERBARÊ QEWÎKIRIN Û PARASTINA AVAHIYÊN DÎROKÎ